# ALFABEYA Kurdî

Alfabeya Kurdî ya Latînî ji 31 tîpan pêk tê. Ji van, 23 tîp dengdar, 8 tîp jî dengdêr in. Pevdengek jî heye ku ji du dengdaran pêk tê:

**Tîpên dengdar:**

| | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| B | C | Ç | D | F | G | H | J | K | L | M | N |
| P | Q | R | S | Ş | T | V | W | X | Y | Z | |

**Tîpên dengdêr:**

| | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|
| A | E | Ê | I | Î | O | U | Û |

**Pevdeng:**

**Xw**: *Xwarin, xwe, xweyî, xwezî..*

**Tîpên Gir:**

| | | | | | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| A | B | C | Ç | D | E | Ê | F | G | H | I | Î | J | K | L | M |
| N | O | P | Q | R | S | Ş | T | U | Û | V | W | X | Y | Z | |

**Tîpên Hûr:**

| | | | | | | | | | | | | | | | |
|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|---|
| a | b | c | ç | d | e | ê | f | g | h | i | î | j | k | l | m |
| n | o | p | q | R | s | ş | t | u | û | v | w | x | y | z | |

Bi mînekan alfabeya Kurdî

| Gir | Hûr | pêş | nav | paş |
|---|---|---|---|---|
| A | a | **a**ştî | n**a**n | xwed**a** |
| B | b | **b**av | a**b**orî | ere**b** |
| C | c | **c**amêr | xe**c**ê | he**c** |
| Ç | ç | **ç**av | bax**ç**e | qere**ç** |
| D | d | **d**ar | a**d**ar | çan**d** |
| E | e | **e**lezîz | ş**e**fqet | wêj**e** |
| Ê | ê | **ê**var | p**ê**şbazî | er**ê** |
| F | f | **f**eqî | ber**f**în | ber**f** |
| G | g | **g**enim | a**g**ahî | colemêr**g** |
| H | h | **h**êvî | bi**h**ar | doje**h** |
| I | i | **i**raq | z**i**kat | l**i** |
| Î | î | **î**şev | d**î**lan | ban**î** |
| J | j | **j**iyan | ro**j**î | nimê**j** |
| K | k | **k**urdî | bê**k**es | zaro**k** |
| L | l | **l**aw | we**l**at | di**l** |
| M | m | **m**ela | a**m**ade | ste**m** |
| N | n | **n**imêj | bê**n**der | kurdista**n** |
| O | o | **o**merî | k**o**mele | xal**o** |
| P | p | **p**êxember | pe**p**ûk | hes**p** |
| Q | q | **q**ur’an | pa**q**ij | he**q** |

| | | | | |
|---|---|---|---|---|
| R | r | **r**izgar | be**r**malî | biha**r** |
| S | s | **s**têr | zivi**s**tan | tir**s** |
| Ş | ş | **ş**îlan | bihi**ş**t | zebe**ş** |
| T | t | **t**erî | ne**t**ewe | bihiş**t** |
| U | u | **u**mîd | d**u**rist | t**u** |
| Û | û | **û**siv | n**û**jen | bir**û** |
| V | v | **v**exwarin | e**v**în | şe**v** |
| W | w | **w**elat | e**w**le | ke**w** |
| X | x | **x**ezal | pa**x**il | ber**x** |
| Y | y | **y**ar | di**y**arî | me**y** |
| Z | z | **z**êr | der**z**î | pîro**z** |

**Cudahiya Alfabeya Kurdî û Tirkî:**

Tîpên Kurdî piraniya wan wekî tîpên Tirkî ne. Tîpên di Kurdî de hene û di Tirkî de tunenin. Ew jî; (**î, û**, **ê**, **w**, **x**, **q**) ne.

Tîpên di Tirkî de hene û di Kurdî de tunenin. **(ü, ğ, ö, ı)**

**Û:** Ev tîpe wekî ‘u’ ya Tirkî tê xwendin. Mînak; bûk, kûr, şûr, bûn.

**Ê:** Dengekî di navbera “e” û “a” yê de ye. Mînak; şêr, kêr, dêr, têr.

**W:** Ev jî mîna “waw-(و)”a ‘erebî tê xwendin. Mînak; welat, ew, wan, wir.

**X:** Ev deng ji qirika mirov derdikeve, wekî “xê-(خ)” ya ‘erebî ye. Mînak; xal, ax, xanî, xurt.

**Q:** Ev jî dengekî ji qirika mirov derdikeve, wekî “qafa-(ق)” ‘erebî ye. Mînak; qenc, baqil, quling, meqes.

**Î:** Ev tîp wek “i”ya Tirkî ye.

**Dengên Cêwî:** Di **kurmancî** de hin tîp hene ku bi du awayan tên xwendin, wekî; ç, k, p, t, h, r.

**/Ç/:** ji bo vê tîpê du deng hene, nerm û hişk:

| **Nerm** | **Hişk** |
|---|---|
| Çem | çar, çardeh |
| Çêlek | çê |
| Çiya | çand |
| Çerm | çawa |
| Çil | çerx |
| Çav | çûn |
| Çek | çima |

**/K/:** ji bo vê tîpê du deng hene, nerm û hişk:

| **Nerm** | **Hişk** |
|---|---|
| Kerr | ker |
| Kor | ken |
| Ka | kes |
| Kirin | kelandin |
| kurbeşk (porsuk) | kiras |
| kezeb | ketin |
| Kej | kebab |

| | |
|---|---|
| Kanî | kef |
| Kakil | kaş |
| Karik | kûr |

**/P/:** ji bo vê tîpê du deng hene, nerm û hişk:

| **Nerm** | **Hişk** |
|---|---|
| penêr | pak |
| Pez | peyda |
| pîvan | paytext |
| pîvaz | pel |
| piling | pûç |
| Parr | par (behr) |
| payîz | pêl |

**/T/:** Ji bo vê tîpê du deng hene, nerm û hişk:

| **Nerm** | **Hişk** |
|---|---|
| tenik | teşt |
| tenûr | tebat |
| tav | teşî |
| tûj | tenê |
| tengav (boğaz) | tişt |
| terr | teze |
| Tîr | temaşe |

**/X/:** ji bo vê tîpê du deng hene, nerm û hişk. Bi piranî peyvên ku ji ‘erebî ketine nav kurdî bi “x”ya nerm tên bilêvkirin:

| **Nerm** | **Hişk** |
|---|---|
| axa | xûn |
| xezal | xwendin |
| xulam | xew |
| xelet | xweşik |
| xeflet | xweda |
| xem | xelat |
| xerîb | xanî |

**/R/:** ev tîp jî bi du awayan tê bilêvkirin. Di hin peyvan de ev tîp tê kirpandin û sitûr dibe. Vêca ji bo diyarkirina vî dengî em wê tîpê dubere dinivîsînin:

| **Nekirpandî** | **Kirpandî** |
|---|---|
| ker | kerr |
| ber | berr |
| birîn | birrîn |
| pir | pirr |
| bir | birr |
| têr | Têrr |
| Vir | Virr |
| Gir | Girr |
| Gur | Gurr |
| Par | Parr |

**/H/:** ji bo vê tîpê du deng hene, nerm û hişk. Bi piranî peyvên ji ‘Erebî ketine nav kurdî bi “h-(ح)”ya hişk tên bilêvkirin. lê hin peyvên bi kurdî jî bi vî awayî hene :

| **Nerm** | **Hişk** |
|---|---|
| herî | herî |
| Hêk | hewş |
| Hêlîn | henek |
| Hesp | heram |
| Heval | hemal |
| Hezar | Helandin |
| Hatin | Heywan |

Zaningeh